لهخشتهى (20) له ئەنجامى خشتهى روى نەو پرسيارى كه ئايا: (كورملمو رېڅخراوهكانى كورملمى مەدەنى تاچەند پابهند بوون به ناوه رۆكى ياساكانى رېڅخراوهكان و پروزگرم و پەپيرموى ناوخوى خويان)؟، بوژمان دەرەدەكهوت رېژمى (%43,33)ريان ريان وابوو كه (هەندپجار) كورملمو رېڅخراوهكانى كورملمى مەدەنى پابهند بوون به ياساكانى كورملمەكان رېڅخراوهكان و پروزگرم و پەپيرموى ناوخوى خويان، ههروهه رېژمى(21,66)يان ههچ زانياربيهكيان نهپوهه سهبارمەت به ناوه رۆكى پرسارىكه، رېژمى(20%)ى تاكهكانى نموئى توپژينموكهمان پيشان وابوو كورملمو رېڅخراوه مەدەنيەكان توانبو پلانى پابهندن به ياساكانى كورملمو رېڅخراوهكان و پروزگرم و پەپيرموى ناوخوى خويان ، بەلام رېژمى (%15)يان ريان وابوو كورملمو رېڅخراوه مەدەنيەكان به ههچ شپو ميهيك پابهندن به ياساكانى پس لهمان و پروزگرم و پەپيرموى ناوخوى خويانەوه. لهئەنجامدا بوژمان دەرەدەكهوت ، زۆرترين رېژمى تاكهكانى نموئى تاكهكانى پيشان وابوو كه (هەندپجار) كورملمو رېڅخراوه مەدەنيەكان پابهندن به بركه و بەندەكانى ياساكانى رېڅخراوهكان كه له پس لهمانى كورستان دەرچوون و لهگەل پابهندبوونيان به پروزگرم و پەپيرموى ناوخوى رېڅخراوهكانيان.

خشتهى (21) رۆلى كورملمو رېڅخراوهكانى كورملمى مەدەنى له دروستكردى گوزران لەدزگاوا كاپه كورملاپهتېكاندا روون دەگاتەوه

وئلامەكان	ژماره	رێژەى سەدى
پەپى	15	%25
نەخيز	45	%75
كورى گشتى	60	%100

لهخشتهی (21) له ئەنجامی خستنی ووی ئێو پر سبار هی که : (کۆمەڵەو ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی تو ئابوویانە رو ئی کار یگەر ببین له دروستکردنی یۆرسە، گوران له دەرگا کابیه کۆمەلایهتییهکاندا)؟، بۆمان در دهمکویت بهر یۆرمی (75%) یان پێشان و ابو و کۆمەڵی ریکخراوه مەدەنیەکان نەیانئۆنۆه رو ئی کار یگەر ببین له دروستکردنی یۆرسە، گوران له دەرگا کابیه کۆمەلایهتییهکاندا ، هەر وهه ریکخراوه مەدەنیەکان نۆمۆه تو ئۆنۆنۆ مەکان پێشان و ابو و کۆمەڵی ریکخراوه مەدەنیەکان نەیانئۆنۆه رو ئی کار یگەر ببین له دروستکردنی یۆرسە، گوران له دەرگا کابیه کۆمەلایهتییهکاندا، به لایم له ئەنجامدا و به ئی در دهمکۆمەڵی ئێم پر سبار هی سەر موه ئی بۆمان در دهمکۆمەڵی ریکخراوه مەدەنیەکان نەیانئۆنۆه به ئی پێست گوران له لایم کابیه کۆمەلایهتییهکاندا بکەن.

دەر ئەنجامەکان

1. هەر ئی کەمێنەپەیک له کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی کار یگەر یان هەر بو و هەر سەر لێسەر کەمەر دەر مو کاکر دەر هی چەند دێر دەپەیک، کۆی کۆمەلایهتی و هەر وهه کار یگەر یان هەر بو و هەر سەر لێسەر گوران و هەر ار کردنی به شێک له یاساکانی عێراق و دەر کردنی چەند یاسایهکی نو ئی کوردستانی، له پێناو باشت کردنی دو ئی کۆمەلایهتی و خێزانی .
2. ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی و کۆمەڵەکان له ئاست چار سەر کردنی گرتەکانی ناو دەرگای (خێزان) و گرتە کۆمەلایهتییهکانی (دەر وهه خێزان) تو ئابوویانە رو ئی (مەلوانەدی) ببین، وانا نه تو ئابوویانە کار یگەر ی (زۆر به هیز) به خێزانی، نه هێندەش کەمەر خەم و لایم دەر کەر تو ئون له ئاست نو زینۆه هی میکانیز مەکانی چار سەر کردنی کێشه کۆمەلایهتی و خێزانییهکان .
3. کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی (هەندێجار) له هەر لایون بو دروستکردنی هەر هەر گەنگی له گەل (دادگا دەر زراوه یاساییهکان) بو په کالێک دەر وهه ی گرتە کۆمەلایهتییه جو راو جۆر مەکان، وانا به بهر ار ورد له گەل ئاستی گرتە کۆمەلایهتی و خێزانییهکان به شێو مەیک (بەر پر سبارانه) هەر لایان بو دروستکردنی هەر هەر گەنگی نەداوه له گەل دادگا دەر زراوه یاساییهکان .
4. کار یگەر ی نەر یته کۆمەلایهتییه ئێگەتییهکان ئاست یگەکی به هیزی دروستکردنۆه له بهر دەر کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی، له جیهه جێنەکردنی ئێو بر گەو خالایهکی که له بهندی (ئامانجەکان) ی په بر مو ی ناو خویاندا بو ی دەر زراوه، ئێو دەر ئەنجامەش ئێو مەمان بو ده خاتەر و و که کاری کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی مۆدێلیکی نو ییو بهر مەیک، کۆنەخراویش ئێم مۆدێله نو ییه به هیزی دز به نەر یته کۆمەلایهتییهکان و به مەتر سی بۆ سەر ئاسایشی کۆمەلایهتی و خێزانی ده زانی .
5. زۆر یبهی کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی به بهر ار ورد له گەل تەنگر ه کۆمەلایهتی و خێزانییهکان ، ئێو مەدی له پێناو (بەدەست یهێنای بهر ژ وه مەدی تاییه تیبیا) دەر زراوه ئێو مەدی له پێناو له بهر چا و کرتی بهر ژ وه مەدی گشتیبیا دان سەر زراوه .
6. هەر وهه دەر ئەنجام یکی تری تو ئۆنۆنۆ مەکان ئێو دەر گۆر یانە رەتە مەکانۆه که پێشانۆه سەر جەر م کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی ئەجیندای پارته سیاسییهکان په بر مو دهمکۆ، چونکه ئێو تو ئۆنۆنۆه یه بۆمان دهمکۆ و و که زۆر یبهی کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی ، بو جیهه جێنەکردنی ئەجیندای پارته سیاسییهکان دان سەر زراوه، به لکو به ناوی جیهه جێنەکردنی ئەجیندای خویان دەر زراوه ترارون له بواری په بر وری جو راو جۆر دا که له پرۆگرام و په بر مو ی ناو خویاندا بو ی دەر زراوه، ئێگەر چی دیو یکی تری تو ئۆنۆنۆه مکه ئێو راست یهێشمان بو دەر دهمکۆ که له پال ئێم دەر ئەنجامەشدا ، کۆمەڵی ریکخراوەکان بۆنەته پاشکۆی پارته سیاسییهکان و نەیانئۆنۆه سەر به خویانە پر ه به ئەجیندای ریکخراوهی خویان بهن .
7. کۆمەڵی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی رو ئیکی (باش) یان هەر بو و له ئاست چار سەر کردنی ئێو گرتە کۆمەلایهتییهکانی که روو په رووی ر مگەری (ئافورمت) بۆنۆه له هەر یبهی کوردستان، وانا نه رو ئیکی (زۆر باش) یان هەر بو و، نه کەمەر خەشیمان نو ئاندۆه له بهر ار دا، (بای سێبەم) له (دەر واز هی په کەم) ی تو ئۆنۆنۆ مەکان به دو و در یۆر ئی ئێو راست یهێشمان بو دو و پائە مەکانۆه .
8. زۆر یبهی ریکخراوەکانی کۆمەڵی مەدەنی نەیانئۆنۆه کار بو جیهه جێنەکردنی ئێو خالایه بکەن که و مکو (ئامانج) له په بر مو ی نو و ئی کار کردنیاندا مۆ ئی کار کردنیان پێو ر گرتو و و له پێناویدا بو ی دەر زراوه ، چونکه زۆر یبهیان (ئامانج) هکانیان له توانای راست یهتییهی خویان بالترن و هەندێک یهێشان بهی خۆنۆنۆه و له بهر چا و کرتی روشی کۆمەلایهتی کۆمەلگای کوردستان دار یۆر زراوه، له کاتیکیا پێو یسته ئامانجەکانی هەر ریکخراوەک به جۆر یک دەر یۆر ئیت که له گەل (فاکتی کۆمەلایهتی) دا په کەمەگر ی و توانای جیهه جێنەکردنیان هەتی .

راسپاردەکان

به ئامانجی چارمسەرکردنی گرتفته کومه لایهتیهکان و بهتایهتیش گرتفته ئاڵز ماکانی ناو دمزگای خیزان، به پیو بیستی دمزانیین چهند (راسپاردە)ایهک لهم خالانهی لای خواریهوه بخهیند و و:

1- کردنهوهی هوبهیهکی تایهت به کاری کومهلسو ریکخراو ماکانی کومهلی مهدنی لهسەر ئاشتی (سەر و کاپهتی ههرینهی کوردستان، ئهرکی ئهم هوبهیه گهیلاندنی رهوشی بهروه پششو ههچون و ئاستهنگهکانی کارکردنی کومهلسو ریکخراو ماکانی کومهلی مهدفی بئ به (سەر و ک و سەر و کاپهتی ههرینهی کوردستان)، پیو بیسته کاسانیک بو ئهم هوبهیه دیاری بکردن که (شاره زانی و ئهزمونی ریکخراوهی) بکردنه پیوهر بهر له ههر پیوهر یگی تر .

2- پیو بیسته لهسەر ئاشتی سەر و کاپهتی ههرینهی کوردستان هوبهیهکی تایهت به بهدواداچورونی دۆخی توندوتیژی دژ به ئاقرهتان دایمهزرینریت، تاکو لهریگهی ئهم بهریو بهسرایهتیهوه سەر و ک و سەر و کاپهتی ههرینهی کوردستان له نزیکهوه چاو دیزی بارودۆخی ئهو پیشیلاکاری و توندوتیژیانه بکهن که روو بهرووی رهگهزای ئاقرهت دهیتیهوه له ههرینهی کوردستان.

و- له لایهن بهر لهسانی کوردستانهوه چارۆکی ورد به یاسای ژماره (18)ی سالی(1993)ی تایهت به (کومهلکان، بنکه و ناو هنده و ناگهیر بهکان، بکتهیه پیشهیهیکان، سهنگیلاکان) بخشینریتیهوه.

4- بو دروستکردنی گۆرانکاری ریشهیی، پیو بیسته لهسەر حکومهلی ههرینهی کوردستان ئهسکر دزی پرۆزی در یژ خایهن و کارکردن بو (سختاره کومه لایهتیهکان) بگاته مهراج بو پشتیوانی دارایی کومهلسو ریکخراو ماکانی کومهلی مهدنی بکات .

5- ههواره کردنی یاسای (داواکاری گشتی) تالهری ریکهیهیهوه دهسه لاتی زیاتر بدری به داواکارانی گشتی به ئامانجی گهیرانهوهی مافی گشتی لهریگهی له دادگا کانهوه ، چونکه تا ئیستا وهک پیو بیست دمزگای داواکاری گشتی نهیتوانیوه متمانهی کومهلگا بهدهست بهئینت.

لیستی سههر چاو ماکان

پهیکهیم: پهیر توو که کور دینهی ماکان

- 1- دامهزراوهی مهین، کومهلگهی مهدنی ههزینی نزی، و: کوسار فتاحی، دمزگای توتیژینهوه و پلادو کردنهوهی موکردیانی، ههولیر، 2006 .
- 2- رابینز، ستیغان، مملاتی، و گۆرانکاری ریکخراوهی، و: ئهسکر خۆشلو، بهشی روناگهیری مهکتبهی ریکخستی (ی.ن.ک) ، سالیانی 2000،
- 3- سهیران، عهنا نهحمدا، کاری ریکخراوهی لهکومهلگای مهلندیا، بئ چاچانه، سالیانی، 1999.
- 4- سلیم، د. شاكر مصطفى، قاموس الانثرولو جیا، مطبعة کویت، کویت، 1981.
- 5- کومهلگای دانهر، ریکخراو ماکان لهسهدهی بیست و یهکهم دا، و: محمهلا مستهفا قهره ماضی، مرکز مشرعات الولیه الخاصه، بئ میژوو.
- 6- یاسای ریکخراوه کوردستانیه ناخکه مهی ماکانی ههرینهی کوردستان، وه قایعی کوردستان، ههولیر، 2001.

دووهیم: پهیر توو که عهر دینهی ماکان

- 1- الحسن، الحسینی، د احسان محمد و د. عبدالمنعم، طرق البحث الاجتماعي، دار الكتب للطباعة و النشر جامعة الموصل، 1989.
- 2- حسن، د. عبدالناصر محمد، اصول البحث الاجتماعي، طبعه 12، مهة، قاهره، 1998.
- 3- محمد، عبدالحمید طاش، مصطلحات ومفاهيم الجلیزیه فی الخدمه الاجتماعیه، مکتبه السیکان للنشر الریاض، المملكة العربیه السعودیه، 2002
- 4- معتوق، د فریدیک، معجم العلوم الاجتماعیه، اکادیمیه انثر و نشونال، لبنان، 1993.
- 5- میشل، د دینکن، معجم علم الاجتماع، ترجمه د. احسان محمد الحسن، دار الحریه للطباعة، بغداد، 1980.

سینهم: گۆ قار ماکان

- 1- ئیروانی، موسلیح عبیدولقه هار، کومهلگای مهدنی و ئاستهنگهکانی، گۆ قاری سهنتهری براییه، ژماره 15، 2001.
 - 2- شیخ، کامیل، گهیرانهوهیهک بو نیموکراسی و کومهلگهیهکی مهدنی، گۆ قاری سهنتهری براییه، ژماره 23، بههاری 2002.
 - 3- عهلی، دانا حسین، رۆلی ریکخراو ماکانی کومهلی مهدنی لهروستکردنی برباردا، گۆ قاری خامه، ژماره 2، زستانی، 2006.
- چوارهم: مهلهر ماکان**
- 1- ابویکر ارمله، مفهوم الاصلاح ام اصلاح المفاهيم او لا، ليبيا، 2005، متاح على الموقع الالكتروني التالي www.libyanwritersclub.com
 - 2- وهب شاه محمد، کامیان کعبه تهرانی تهریز، ههولیر، 2006. www.kurdistan4news.com
 - 3- تیسیر محسن، محاوله اوبیه للتاویل فی مفهوم الاصلاح، 2005، متاح على الموقع الالكتروني التالي (www.sis.gov.ps)
 - 4- احمد الرحال، الاصلاح فکرة و مشروعاً، مجلة اقلام عدد العاشر، مغرب، 2004، متاح على الموقع الالكتروني التالي (www.aqlamonline.com) .
 - 5- عبدالغفار شکر، شأته وتطور المجتمع المدني، مكرتاته واطاره التنظيمي، 2005، موقع www.rezgar.com .

Gotinên lêburînxwaztin ê di zimanê kurdi de

“Bandor û taktîkên wan di çarçove, têkilî û danûstandinên cihê de”

M. BARAVAN WAHEED HASAN

Mamoste li zanîngeha Newrozê, li Kurdistana Iraqê

Pûxte

Lêburînxwaztin biyavekê gimge ji biyavên zimanî, ku diçîte di nav kirdeyên axvînê de, ser bi piragnatîkê veye. ev vekolîne hewil dide vekolînê li taktîkên lêburînxwaztin ê di keltûrê zimanê kurdi de (bi ket, ka çewa hatîne bikarhînan. vekolîn bi navunîşan ê: (taktîkên lêburînxwaztinê di zimanê kurdi de), hewil dide bizanî, ka di her barekê peywendîya asoyî û stûnî de zêdetir pena bo kîj taktîkê hatîye birin, vekolîn li div rebaza wesfî şkarî hatîye encamdan û bo gehstina rêjeya bikarhînana her taktîkê pena bo şêwazê amarê hatî e birin. armanca serekî ji evê vekolîne ewe bihête zanîn, ka di her barekî ji barên peywendîya asoyî û stûnî de kîj straficyet bo lêburînxwaztinê hatîye bkarhînan. ev vekolîne ji dû pişkan pêkdhêt, pşka êkê bi navunîşan: (lêburînxwaztin û straficyetên ewê)ye, ku têda bi şêwekê giştî behsê têgehe lêburînxwaztin û lêburînxwaztin wek kirdeyek a axvînê û taktîkên lêburînxwaztinê hatîye kirin û pişka duwê ya taybete bi (lêburînxwaztin di peywendiyên asoyî û stûnî de).

Apologetic phrases in the Kurdish language "their effects and tactics in various contexts and dealings"

BARAVAN WAHEED HASAN

Teacher at Newroz University, Iraqi Kurdistan

Abstract:

This study attempts to analyze phrases of apology in the culture of the Kurdish language and how to use them. By knowing the methods and tactics that were used in many types of relationships, whether horizontal or vertical, the analysis was completed according to the descriptive approach and understanding the percentage of use of each phrase. The main objective of this analysis is to find out the different apologetic phrases in various horizontal and vertical relationships. This study consists of two parts: the first is about the concept of apology, its methods, and objectives, and the second is an analysis of the different apologetic phrases (horizontal and vertical). There are several expressions of apology for each case of disagreements or oppositions and quarrels, which differ according to their contexts and the nature of the relations between the parties., between the student and the teacher, as well as between the trainer and the trainee, between the manager and the employees, and between the father and the son.

العبارات الاعتذارية في اللغة الكردية
(تأثيراتها وتكتيكاتها في مختلف السياقات والتعاملات)
بارافان وحيد حسن (مدرس في جامعة نيروز - كردستان العراق)

تحاول هذه الدراسة تحليل عبارات الاعتذار في ثقافة اللغة الكردية وكيفية استخدامها. من خلال معرفة الطرق والتكتيكات التي تم استخدامها في أكثر من علاقة سواء أكانت أفقية أم عمودية ، وقد تم الانتهاء من التحليل وفق المنهج الوصفي ومعرفة نسبة استخدام كل عبارة. الهدف الرئيسي من هذا التحليل هو معرفة العبارات الاعتذارية المختلفة في مختلف العلاقات الأفقية والعمودية. تتكون هذه الدراسة من جزئين: الأول عن مفهوم الاعتذار وطرقه وأهدافه، والثاني تحليل العبارات الاعتذارية المختلفة (الأفقية والعمودية).

هناك عدة عبارات اعتذار لكل حالة من حالات الخلافات أو المعارضات والمشاحنات، تختلف باختلاف سياقاتها وطبيعتها العلاقات بين الأطراف، فهناك عدة عبارات اعتذارية عند الاختلاف بين الشركاء، وكذلك عند التعارض بين الأصدقاء، وعند الخلافات بين الزملاء والأصدقاء، وهناك أيضاً عدة عبارات اعتذارية عند وجود خلافات بين الطالب والمعلم، وكذلك بين المدرب والمتدرب، وبين المدير والموظفين، وبين الأب والابن.

پێشکێ

Navunîşan ê Semînar ê:

Ev Semînarbi navunîşan ê (taktîkên lêburînxwaztin ê di zimanê kurdî de) ye tède hewil hatîye dan behsê ewan taktîkên bhête kirin, ewên di nav peywendîya asoyî û sînî ya barên jêkcyawazda bikardhên. ewjî ji pêxemet hindêye daku ewê dilmanê nehêlîr û dûbare xoşbûna peywendîyan di nav hevpişkên axxvinê de peydabiket.

Giringiya Semînar ê:

Giringiya evê Semînardî hindê de ye, ku eger di zimanê inglîzîda vekolîn li ser (lêburînxwaztin ê) di zimanê kurdî de harbine nvêsin, lê bi zimanê kurdî çî vekolînên taybet li ser (lêburînxwaztin ê) nehafîne nvêsin, zêdebarî hindê lêburînxwaztin berdewan di nav takekesên civakî de pena bo dihête bîrî û rêkêka giringe bo nehêlana arîşeyan.

Sinûrê Semînar ê:

Bo encamdana Semînarê, (100) kesên xelkê govêra behdînî hatîne wergerîtin, ku ta radeyekî di pêgehşî bûn û dîrî û boçûnên ewan di çend barên cyawaz de li dor lêburînxwaztinê hatîne wergerîtin.

Rêbaza Semînar ê:

Ev Semînare bi şewekê gşî li duv rêbaza (westî- şîkarî) hatîye encamdana, bi pşbestin bi şewazê amarî jîbo gehşîna rêja bkarhînanana stratîcyetên lêburînxwaztin ê.

Pirsyarên Semînar ê:

Semînarhewl bide bersîva evan pirsyaran bide :

- 1- di barê hebûna arîşê di navbera dû kesên biyanî de, zêdetir kîjî sitratyecyeta lêburînxwaztin ê hatîye bikarhînan!?
- 2- di barê hebûna arîşê di navbera dû hevalanda, pena bo çend sitratyecyeten lêburînxwaztin ê hatîne birin!?. hwd
- 3- di barê hebûna arîşê di navbera xuşk û birayên êk temen de zêdetir pena bo kîjî sitratyecyeta lêburînxwaztin ê hatîye birin û ew taktîke çîye !?
- 4- di barê hebûna peydabûna arîşê di navbera dû hevkarên de çend taktîkên lêburînxwaztin ê hatîne bikarhînan!?
- 5- di barê hebûna arîşê di navbera qutabî û mamostay de, kîjî taktîkên lêburînxwaztin ê hatîne bikarhînan!?
- 6- di barê hebûna arîşê di navbera rahênerî û yanîkerêkî de, çend taktîkên lêburînxwaztin ê hatîne bikarhînan!?
- 7- di barê peydabûna arîşê di navbera fermanberêkî û rêveberî de, rêjeya ewan taktîkên lêburînxwaztin ê ewên hatîne bkarhînan, bi çî şewey ne!?
- 8- di biwarê peydabûna arîşê di navbera bab û kurî de, çend taktîkên lêburînxwaztin ê hatîne bikarhînan û rêjeya her êk ji ewan çende!?



Pişkên Semînar ê:

Ev vekolîne jibîl pêşekî û encaman ji dû pişkên pêkdhêr. pişka êkê bi navunişan ê (lêburînxwazîtin û taktîkên ewê)ye, ku evan teweran bi xweve digrît: (lêburînxwazîtin),(lêburînxwazîtin wek kirdeya axvîtin ê),(tegezên serkî ên lêburînxwazîtin ê), (lêburînxwazîtin û astên ewê), (serpêçî û astên ewê), (lêburînxwazîtin û rewşberzî) û (taktîkên lêburînxwazîtin ê).

pişka duwê bi navunişan ê (lêburînxwazîtin di peywendiyên asoyî û stûnî de), ku dû teweran bi xweve digrît, ewji evene: (lêburînxwazîtin di peywendîya asoy de) û (lêburînxwazîtin di peywendîya stûnî de).

Pişka êkê :

1.1. lêburînxwazîtin û taktîkên ewê

1.2. lêburînxwazîtin:

Lêburînxwazîtin kiriyareke di hemî keltûr û civakan de hebûna xwe heye. ev kiriyare li dev hemî keltûr û kesana weku êk nahête temaşekirin, lê bigiştî bi karekê baş û erênî dihête danan.

lêburînxwazîtin bi tinê ji derbrîneka sade weku (bîbure) pêknehatîye. belku çendîn şêwaz û rêkên lêburînxwazîtin ê hene. di pîrosêsa lêburînxwazîtinê de têbînîya dû xalana dihête kirin:

A- li despêkê pêdviye to yê hurbîn bî, derbarey dana derbrînên hestidar û axvîtinan li dor her şaşîyek e.

B-bi şêweyekê guncay watalaya li pişt lêburînxwazîtin a arîşê diyar bikey. (Robin, 2008:360)

li dor şrovokirîna têgehê lêburînxwazîtin ê, dbît çend şrovokirîn û dîtn bo evî têgehî hebn, anku dbît kesek husa hizrbket ku lêburînxwazîtin derbrîneka hestidar e û kesekê dî dbît hizrbket ku danpêdan e bi şaşîyekê. (Robin, 2008:360) anku li demê kesek peşêman dbît bi encamdana şaşîyek ê, radbît lêburîne ji kesê beramber dixwazît, daku ziyane yan çî kêşeyan bo dirust neket. (ebdulwahîd muşîr dizeyî, 2009:17) weku li demê kesek dibêjîte kesekê dî:

-bîbure, ez şaş bûm.

li dor pênaseya lêburînxwazîtin ê zanayana bi çend şêweyan pênasekirîy e. weku:

A-(Kuhîn)derbarey pênaseya lêburînxwazîtin ê dibêjît: lêburînxwazîtin ew cure lédwanin, ewên ji encamê azarekê dirust dibin, evca çî bi mebest bin yan bê mebest bin. (Cohen,1999:72)

B-(Garkiya) lêburînxwazîtin ê bi evî rengî pênasê diket: lêburînxwazîtin bi core ruhnikirnek ê dihête pêşkêşkirin bo kesekî hatbîte kartêkirin yan êşandn ji kar û kiriyar ên kesekê dî, bêy hebûna hîç niyazeka şerangêz, ku bi derbrîna peşêmanîyê ve ya grêday bît yan danpêdananeka aşkera ye bo ewê êşandna kesê beramber û li gel derbrîna peşêmanîyê bo vegerandina peywendîyan wekî berê heyn. (Garcia, 1989:44)

C-(Gufman) sebarey pênaseya lêburînxwazîtin ê dibêjît: ew amajepêkirme ku takekes bi rêka ewê dabesî dû parçan dbît, parçek jê tawanbarbûne bi serpêçîyê û parçeka dî xwe cudakirne ji xelêfîyê û dûpatkirna bawerîyêye bi yasayên serpêçîyêve. (Goffman,1972:113)

D-(Hulumês) diyardket ku lêburînxwazîtin kiridareka axvîtinêy e ji bo parazîtîna rumeta bi dhête gutin, bo mebesta çareserkirna serpêçîya ewy kesê jê berprisyar û bi evî şêwey dûbare vegerandina

hevsengyêye di navbera **A** û **B** de. **A** ew kese ewê lêburîne dxwazît, û **B** ew keseye yê serpêçî li gel hatîye kirin. (**Holmes,1990:159**)

E- (Çit) didete diyarkirin ku lêburînxwaztin daxwazkirine di bersvdanêda ji pêxemet peşêmanbûnê û ew kerestene jibo berprsyarkirina kesên serpêçkar di nav komelgehê de û husa ew hindêk ji girintiyê ê diden ku serpêçkar di dahatî de dê xo ji şermzarbûnê dûr ragrît û dibit bibîte egerê bihêzbûna komelgehê. (**Gill,2000: 24**)

ji encamê evan hemî pênasayên li serî di şiyanda ye bêjin: lêburînxwaztin birîtiye ji ewan kerestên zimani ewên serpêçkarî jiber peşêmanbûna ewy bi kiryarê radbît bi daxwazkirina lêburîne ji kesê serpêçî li gel hatîye kirin.

1.3.Lêburînxwaztin wek kirdeya axvtinê:

Armanca tiyora kirdeya axvtinê şrovekirina alugorkirina zimani ye derbarey ewê kartêkmê ewa **I** ser axvtinkerî û guhdarî drustdbît. ustn bi damezrênerê tiyora kirdeya axvtinê dhête hejmartin, ew bangeseya hindê diket, karê raperandin (performative) û karê ranepemandin (constative) ji dû kirdeyên serêkî yên axvtinê dihêne hejmartin. karê ranepemandnê ji ewan axvtinan pêkhatîye ewên derbarey rastîyan dhêne biryardan û ev core axvtine nabne egerê çî karu refaran. ji aliyekê dîve karê raperandnê ji ewan axvtinan pêkhatîye ku li ser keyfxoşiyê yan jî li ser karu refarên ewan dhêne helsegandin. ev herdû corên kirdeyên axvtinê bi bîncîneyê polînkirînên zimani dihêne hejmartin, ku dibine egerê şrovekirinek a kûr zimani.

Feylesufê emrîkî (sîrî) kirdeyên axvtinê dabêşî pênc coran diket, ewjî evene: (dana fermanan (Directives), dana biryaran (declarations), dana lédwanan (Assertives), derbrîna hestan (expressives), diruskirina peymanan (commitives)). (**ebdulwahid muşîr dîzeyî, 2011: 56-57**) lêburînxwaztin dçite di nav kirdeya derbrîna hestan de, (**Şêzad sebrî êfî, 2014: 201**) û (**qeyis kaka tewfîq, 1995: 59**) ku rolekê karîger di nav peywendiyên mirovî de wekî kiryareka axvtinê bo parazîna seruçav yan şikumentiyê gêraye. ji berhdê ya girînge bizanîn ka lêburînxwaztin çiyê û çewa dhête bkarhînan. kiryara lêburînxwaztinê ji çareserên kirdeyên axvtinê dihête hejmartin, bi wataya hindê ku axvtinker bi rêka ewê kirdeyê hewl didet seruçav û roxsarê xo ji ber kiryareka ne di cihê xoda bi parêzît. (**Searle, 1969: 12**)

(kuhn) û (ulştin) diyar dken, ku lêburînxwaztin weku kiryareka axvtinê di navbera dû pişkdaran de peydadbît, ku êk ji ewan pişkdaran çaverêdket yan hestpêdket ku jhejiye gere bo bhête kim yan jî bo bhête ruhknrt ji ber ewê serpêçîya ji alyê kesê beramberve derbarey ewy hatîye encamdan. di evî barudoxîda, êk ji pişkdaran yê azade ku lêburîne bxwazît yan ne, yan jî danpêdanê b berprsyaretiyê yan tundufîyê bkê yan neket. jberhdê jî lêburînxwaztn di evî barîda rolekê karîger wekî xaleka grnga rewşberzîyê dgêrît. (**Cohen & Olshtain, 1983:20**) lê ji alyekê dîve, hindêk caran jî kirdeya axvtina lêburînxwaztinê ji bo supasîkirina kesê beramber dhête bkarhînan.(Ayad) bo nmûne eger kesek harîkarîya kesekê dî bkê. wekî (glasekê avê bdetê, destê ewy/ ewê bgriî û ji erdî raket, pêlava ewy/ewê bo bdanît...htd) û bi taybet jî eger astê ewan yê kumelayetî nêzîkî êk bît, ev core lêburîne dhêne gutin mîna (nene b bure, ne ne to b xudê weneke,qusîrîyê efu ke, efu..hwd) ku eve hemî bo me diyardket ku merc nine, li demê lêburîn dihête xwaztin hemî deman serpêçî habîte kirin, belku gelek caran lêburînxwaztin bo kesekî ji encamê encamdana qencîyekê dhêtedan.

1.4.Piragmatîk û lêburînxwaztin:

Bacmen didete diyarkirin ku şiyanên piragmatîkê ji xaleka gîng a avakirin a zimaneke prufêşnal dihête hejmartin. têgehştinên piragmatîkê amajeyê didene têgehşûna zimane axvtinê û şrovekirina hest û heluystên axvtinkerî. herwesa amajeya şyan û mebesta axvtinkerîye ji bo helbjartina bersvdaneka guncay, jber hindê dbêjn ku di piragmatîkêda pêdvîye guhdar şarezay

têgehşinêka baş ya pêzanînên zimanvanî bît. wekî peyvên ferhengî û sintaksî û zanyary ên naveroke. wekî role pleya civakîya axvtinkerî. (**87: Salehi, 2013**) di evî barîda (barûn) şyanên piragmatîkê didete pênasêkirin ku zanîna serçaweyên zimanvanî ye ku dberdestin di zimanek ê diyarkrîda ji bo têgehşina mebesteka diyarkirî yan zanîna şêwe û dimenekê berçavê kirbareka axvtinê ye û li dumahiyê zanîna bikarhînana naverokeka rêkxstîye di serçaweyên zmanî de. (**Kaya, 2012 : 48**) aşkeraya kiryara lêburînxwazîin ê dibîte egerê têkçûna roxsarê puzeîv yê axvtinkerî, her ji ber evê yekê ev kese pêdvî bi astekê bilnd ê lêburînxwazîinê û taktîkên ewê ye, daku bşêt lêburînxwazîinêka baş û guncay derbrîrê û ev kese bihête parazîin ji egerê têkçûna roxsarî.

1.5.Regezên serekî ên lêburînxwazîin ê:

Derbarey regez û pêkhênerên her lêburînxwazîinêkê, zana evan xalên li xwarê didene diyarkim: (**Deutschmann, 2003: 44–47**)

A-Serpêçkar(offender) : ew kesê berprsyar bi encamdana çend serpêçîyan, yan jî hest bi berprsyareîyê bi şêweyekê rastewxo yan nerastewxo ji bo karekê hatîye encamdana diket.

B- Zulmlêkrî(offended): ew kesê karîgeîya xirab lêbûy, yan dbît bhête kartêkirin, yan jî hest bi hndê dket, ku kartêkirin ji alyê serpêçkarîve lê hatîye kirin.

C-Serpêçî (offence): ku dbît serpêçîyeka rast bît û hatbîte encamdana, yan jî ya veşartî bît, yan jî bi tenê hesitkirin bît bi serpêçîyê.

D-Çareserî(remedy): evejî têgehşîin û berprsyareîya wergrîina ewê serpêçîyê û nûsandana (peşemana) ê ye.

1.6. Lêburînxwazîin û astên ewê:

1.6.1.lêburînxwazîin di peywendîya asoyî de:

Lêburînxwazîina di navbera dû kesên di êk astê civakî de, dmînte li ser astê ewê serpêçîyê û ewê peywendîya di navbera serpêçkarî û zulmlêkrî de hey. herwekî (Al-Adaleih) bangêşeya hindê diket, ku daxwaza lêburîinê di navbera dû kesên biyanîda zêdetir rwyddet û dhête bkarhînan ji dîkkesên nêzîkî êk. weku hevalan, çunkî lêburînxwazîina hevalan dibît gelek caran husa bhête dîtn, ku gelek diwartir û bi jantirbîr ji ewê arîşeya rûday, jî berhndê jî heval hewlîden bi rêka lêburînxwazîinê a bitirane ve peywendîy ên xwe dîbare xoşkeneve. ev lêburînxwazîinên bi galtecarî di baruduxek ê hevalnî de dhêne gutin, ku core xizmayetîyekê bi xovedgrîr û amajeyê didete ewê nêzîkîya di navbera ewan kesan de di nav komelgehêda hey. ev curê lêburînxwazîina galtecarî dbêjîinê tirane) (**Al-Adaleih, 2007: 190**) û herwekî (îç- Leech) ddete diyarkim " eve ew rêke ya dibêjîinê: em di pêdvî nînin, ku ji bo hevdu bi rewşî baxxvîn, ez dşêm te kêmbkem, û to jî weku tirane de serederîyê li gel key. ku evejî ewê çendê dgehînî, em hevalên başîin". (**Leech, 2014: 101**) dîsa (sugîmutu) ddete diyarkim, ku hndî peywendîyên di navbera serpêçkar û ew kesê hatîye êşandin de di nêzîk bin, de bi sanahîr û bi sîngêkê berfrehîr ew daxwaza lêburîinê ji alyê zulmlêkerîve hête pêşwazîkirin. (**Sugimoto,1999:67**) di keltûrê kurdî de derbrînên lêburînxwazîinê di navbera dîkkesên nêzîkî êkde weku hevalan gelek bi kêmî dhête dît, bi tinê di hindêk barên taybet de nebît, ku arîşe ya mezin bît, bo mebesta dîbare çakkirina ewê arîşê li ewî demî lêburîin dihête xwazîin. ev derbrînên lêburîinê di keltûrê kurdî de ji egerê cudahiya regezên nêr û mê bi dû şêweyên ji êkuda diyar dibn, ewjî ji ber regezê mê pîr ji zelamî xudan soz û arîfeye. di encamda ev regeze derbrînên taybet ên axvtinê bi reftarên xove di nav kumelgehê de bkarhînn. bara pîr ya caran afret li demê lêburînxwazîinê, derbrînên xo tawanbarkrînê û şeprezbûnê bkarhînîr ku eve hemî nîşanên bêhêzî û bêdesthelatîya ewê diyardken. (**fareeq, 2014 : 245**)

pêdvîye ewê çendê bêjîn, eger ew arîşe di navbera dû hevalanda ya mezin bît, weku li demê trumbêla hevalê xo tûştî rudanekê biket yan laplup yan mubayla ewî bşkênit ,di ewî demîda barapîtir a caran heval daxwaza lêburîne ji êk dxwazn, sereray şrovekîna barudoxê ruda û belên ji dhêtedan ji alyê kesê serpêçkarve ji bo dûbare çakkîna ewî tûştî, belê eger ew dû kes dbyanî bin dbît ji ber arîşeka zora biçûk mîna li ser cadeyê mlên ewan bi yekbkevin yan brîna peyva kesê beramber, li ewî demî lêburîn dhête xwazîin . (**Al-Adaleih, 2007: 190**)

1.6.2.Lêburînxwazîin di peywendîya stûnî de:

Ciyawazîya pleyên civakî di navbera zulmlêkrî (offended) û serpêçkar(offender)de di barekê serpêçyê yê taybeta rolekê karîger li ser peywendîyên ewan heye û dhête pêşbînîkirin ku lêburînxwazîneka kartêker ji kesekî bo kesekê di drustbît di ewî biwarîde (kîger) didete diyarkirin, ew kesên xudan pleyeka mezin û bilnd di nav civakîda wekî rêveberan, bi zehmet dbinn ku lêburîne bxwazîin, anku dampêdanê bi xeletîya xo bken, ji berku ew di tirsîn weku kesekê neyê karîger yan kêmbihêne pêş . (**kiger,2004:57**) li duv bawera pîrîya civakên cîhanî, husa nişa me diden, ku refarên takekesî li duv pleyên civakî dhêne diyarkirin. bo nimûne takekesên xudan pleyên nizmên civakî. wekî (pale, kesên temen biçûk. weku xuşk û bira ên biçûktir...hwd) çaverê jê dhête kirin daxwaza lêburîne ji kesên xudan pleyên civakî yên ji xo bilntir bken wekî hosta, rêveberê karî, yan ji her kesekê di ku xudan temenekê meznîtr bît ji kesê lêburînxwazîi. weku dayk û bab û bira û xuşkên mezn...hwd. (**Mulamba.K,2009:553**).her jiber evê çendê jî (aguino) pştevanîyê li evê boçûnê diket û didete diyarkirin ku ew kesên xudan pleyeka berza civakî, li gel kesên asayî di barudoxekê neyê aramda dbne egerê hindê ku kesên asayî daxwaza lêburîne ji ewan bixwazîin yan li pasaw hînanekê bgerin daku ji ewî barudoxî rzgar bibin. (**Aquino,etal,2006:653**) di keltûrê kurdewarî de li demê peydabûna arîşekê di navbera kesekên asayî yan biçûk bi temenên xwe ve beramber ew kesên xudan pleyên bilnd û meznîtr wekî (dayk, bab, birayê mezin, xuşka mezin, mam, xal, xalet, methwd) bara pîr a caran ji alyê ewan kesên biçûk yan asayîve lêburînxwazîin dihête bi chhînan, çunkî keltûrê kurdî. yê pre ji rêzgrîtinê û şermê, bi taybetî beramber kesên mezn û xudan pleyên berzên civakî (**Fareeq,2014:87**) ji ber hndê jî çend pleya civakîya kesê serpêçkar ya bilndbît, gelek bi kêmbî dhête dîtn, ku lêburîne bxwazîi. hndî kesê zulmlêkrîyê, li demê peydabûna arîşekê li gel kesên pleyên ewan bilnd di nav civakî de, heznaken li çareserîyê bgerin û lêburîn ji ewan bhête xwazîin, çunkî eger serpêçkar rêveberê ewy bît û kesê zulmlêkrî, li çaverêya êburînxwazîinê bît ji kesê xudan pleya bilnd di nav civakî de ; dbît karê ewy bkevîte jêr hereşê, her ji ber hndê jî zulmlêkrîyê xudan pleya nîzma civakî, dbît hzbket ku bi mîfatre eger peywendîyên ewy li gel kesê serpêçkarê xudan pleya berza civakî bi baş bminn, bêyku kiriyara lêburîne bhête encamdan, her wekî di gelek vekolînan jîda hatîye dîtn, ku li demê kesê serpêçkarê xudan pleya berza civakî xeletîyêkê diket, dampêdana ewy dbîte pîr cihê behskîrinê û li serçavên ewy pîr ji kesê zulmlêhatîyêkrîin diyar dibît, xelekê dewruber jî pîr hest pêdket, ku eger em berawrd bikeyn li gel kesekê xudan pleyeka nîzma civakî ku kêmbîr li ser serçavên ewy diyar dibît. (**Ayad,2017:97**)

Li demê kesekê xudan pleyeka nîzm, lêburîne ji kesekê xudan pleyeka berz dxwazîi, ji ber egerê her serpêçîyeka hebît, li vêrê dbît daxwaza lêburîna ewy retbket, berovajî li demê kesekê xudan pleyeka berza civakî daxwaza lêburîne ji kesekê xudan pleyeka nzm diket, êksêr dhête wergrîtin, çunkî kesê zulîm lêhatîyêkrîin li vêrê li çekê berz mine, ku lêburîna kesê xudan pleya bilnd retbket, ji berhndê jî em dşeyn bêjîn, lêburînxwazîina ji alyê kesên civakîyên bilnd ve dhête gutîin, gelek kartêker û karîgertrn ji ya texên nîzmên cvakî. (**Ayad,2017:96**)

1.7. Serpêçî (offence) û astên ewê:

Bi şêweyekê grîstî kiriyara lêburînxwazîin ê ji encamê peydabûna arîşeyekê diyar dibît, her ji berhndê jî cor û astên evan arîşan li ser struşt û tundutîjî a peydabûna ewê arîşê dhêne diyarkirin. bo nimûne lêburînxwazîin bo rawstana axvîna kesekî di demê axvîtinê de dhête pêşkêşkirin, dê ya

ciyawazbît ji ewê lêburînxwaztin a bo kesekî ku hatbûe eşandan yan dest yan pê yekê ewy hatbûe şkandin.

hejmarek a zora vekolînan tîşk êxstîye li ser peywendîya di navbera lêburînxwaztin ê û tîyora rewştî de, armanca tîyorê bi xwe ji dûpatkirina peywendy a di navbera ast û corên lêburînxwaztin û tundi û diwarîya ewê arîşa ku ji alyê kesekîve hatîye encamdan, jberhndê jî, hndî ew arîşe tund û tîjtir bît, pêdvîye lêburînxwaztin ji baştir û karîgertrbît, lewra jî çendatî û hkmeta ewê rewştberzîyê ku di kirdeya axvîtinê a lêburînxwaztinêda kar pê hatîye kirin, dvêt li cihê astê tunduftîjy a ewê arîşê bît. (Ayad,2017:94) polînkirina cor û astên arîşeyan ji alyê (hulmîs) ve hatîne encamdan, ku bi dabestkirina arîşeyan li ser ciyawazîya astên sengî û girngîya ewê arîşeya serhliday rabûye ,bi evî rengê lîxwarê buye:

1.7.1. Serpêçîya ruh: weku li demê bê mebest mlê xo li mlê êkî bdey. jîrbkey ku tlefîna xêzana xo bkey. yan qelemê hevalê xo berzekey. d evî halefîda gelek b kêmi lêburîn têda dhêre xwaztin.

1.7.2. Serpêçîya navncî: weku l demê bê mebest êk çaverê te bminîrî û to gîru bî yan jîrbkey ku te wachê xo yê çêkey yan l wanaya êkê texîr bibî. dvî barudoxîda rêjeya daxwaza lêburîne geleka zore ,ku kesê serpêçkar l kesê zulmlêkrî bket.

1.7.3. serpêçîya bihez: weku li demê pê kesekî di yariyêda bşkenî yan li demê kêmkirina kesekî bi diwarî di runştînekê yan gengeşekê de...htd. ev barudoxe pîdvî bi lêburînxwaztinê e.

1.7.4. Serpêçîya diwar: weku li demî ziyane li malê kesekê dî bdey. bo nimûne weku trumbêlê, kumpîwterî. ev bare ji hemî barudoxên dî yê ciyawaze ku bi her rengêkê hebît dvêt lêburînxwaztin bhête kim. (hulmîs,1993:91-116)

1.8. Lêburînxwaztin û rewştberzî:

Li demê em bas li lêburînxwaztin ê di keyn, pêdvîy e çemkê (rewştberzî)yê bi berçav bhête wergrîtin, ku li evan çend salên dumahîyê bûye cihê vekolîn û gengeşa kartêkerên mirovayêfî. tîyora (brawn) û (lîvnsn)î ewa base, nehêlana rewştberzîya xirab û pştgrîya rewştberzîya puzeftîv dket, geleka gimge, belê evejî ya bê arîşe nebû, çunkî derbîrîna lêburînxwaztin ê, amîrê nîşandana derbîrîna bi mebest dhête bikarhînan, weku derbîrîna peşmanîyê ji bo daxwazîya lêburînxwaztin ê yanjî ji bo daxwaza lêxuşbûnê ye, dibît husa diyarbît ku ya base eger ev stratîcyete bihête bkarhînan, çunkî rêkeka here base ji bo dûbare xoşbûna peywendîyan û aramkirina derûnê kesê hatîye kartêkrn yan zulm lê hatîye kirin, belê li vêrê vekoleran bi hevra bîru boçûnên xo dayne derbarey ka rewştberzî çîye û neşayîne bi drustî rewştberzî yê şrovebiken, herwesa husa diyar nîne, ku derbîrîna navçavan û roxsarê çemkekê bkarhatî, yê cîhanî bîr, anku jo alyê hemî komelgeh û keltûrên cîhanîve wekî êk serederî li gel bhête kirin (Fraser,1990:230). her wekî (brawn) û (lîvnsn), ewê serederîyê li gel lêburînxwaztin ê dken, ku cewherê ewê ji encamê bikarhînana stratîcyeteka xiraba rewştberzîyêye, ku di encamda li duv dîtn û boçûnên axvîtkerî (ew kesê lêburîne dxwazîf) ku lêburînxwaztin kiridareka têkçûna roxsarîye, ku roxsarê ewy yê puzeftîv têkddet, belê di heman demda lêburînxwaztin, parazîin û keyfxoşkirna kesê duwêye (guhdarî)li gel têkçûna roxsar û derûnê kesê axvîtkere (Brown û Levinson,1987:187) û eve li duv hizra (brawn û lèvnsun)y.

1.9. Stratîcyetên lêburînxwaztin ê:

1.9.1. Lêburînxwaztin a rastewxo:

Di barapîr a barudoxan de kesê kartêker radbît bikarhînana lêburîneka êksere bi rêka cêbecêkirina (Illocutionary Force Indicating Device **IFID**) amîrê karîgerîya hêza derbîrîne ya aşkera . (kîlaw) dbêjît ku rêvebrnka serkevî ya lêburînxwaztin ê weku kirdeyeka axvîtinê dvêt yagreday bît

bi (IFID)ve, anku bi (amîrê karîgerîya hêza derbrînê) ya aşkerave, li gel wergirtina berpirsyarêti yê. (Kîtaw, 2013:2) ev yasa ye, evan derbrînên lêburînxwaztin ê yên li xwarê di zimanê kurdî de bi xwe ve digrît:

-Daxwazalêburînê dkim: ku dhête hejmartin ji stratîcyetên fermî di zimanê kurdî da ji bo pêşnyarkirina lêburînxwaztin ê.

-Bibure: eve bi derbrînên nefermîyên berolav di zimanê kurdî de dhête hejmartin.

- Li min bibexşe- forgive me: ji derbrînên lêgeryana lêburînê dhête hejmartin, li vêrê axvtinker hewlddet ku guhdar lêbburît.

- Li min bbure: ji derbrînên nefermî dhête hejmartin di zimanê kurdî de.

-Min efuke: eveji ji ewan derbrînên rastewxo yên lêburînxwaztinê ne, ku ji zimanê erebî hatîye di nav zimanê kurdî de.

-Gerdena min azake: ev stratîcyeyî wekî derbrînêka ciyakî hatîye wergirtin û ji alyê axvtinkerên zimanê kurdî ve dhête bkarhînan . (Fareeq ,2014:132)

-Ji dil daxwaza lêburînê dkem, gelek daxwaza lêburînê dkem: eveji ji derbrînên lêburînxwaztinê ne û bhêzeka zêdetir di zimanê kurdî de dhête bkarhînan.

-Umêdewarim to ne êşabî : ji derbrînên serzarekî ên lêburînxwaznê dihête hejmartin. (Al-Adaleih, 2007:48)

1.9.2. Lêburînxwaztin a nerastewxo:

1.9.2.1. Stratîcyeta nerastewxo:

Lêburînxwaztin a nerastewxo bi rêka bikarhînana danpêdaneka berpirsyarane dihête pêşkêşkrn. eveji bi rêka danpêdaneka rastewxo û danpêdaneka nerastewxo dhête cêgirkirin. danpêdana rastewxo evan yasa yên sîmantîkî yên li xwarê b xwe ve digrît:

A-Razbûn l ser tawanê, wekî : xeletîya min bû, sed j sedê min xeletî kir.

B-Derbrîna kêmasîya xo, wekî : ez nehndê baş im, di nvêşîna huzanê de.

C-Mebest pênebûn, bo nimûne: merema min ew nebû, min to nedîtbuy, uh bibure bi xeletîve bû.

D-Razbûn li ser serpêçîyê, bo nimûne: ez danpêdanê dkem, ku min pencera şkandî. (Al-Adaleih, 2007:107-110)

Ji alyekê din ve, danpêdana nerastewxo diyar di bît :

A- Şruvekirina haletî:

li demê serpêçkar lêburînxwaztinê dket, bi rêka ruhnikirina barudoxî û bi hîmana belge û behanekê ji bo ewê serpêçîya hatîyekrn. bo nimûne kesek bi ruhnikirina haletê gîrubûnê rabît, bi rêka gutîna li ser cada serêkî rudanek rudabû; ji berhdê, ez dreng gehştîm yanî li min bbure, trumbêla min ji kar kevtbû.

B- Pêşnyarkirn jibo çakkirn ê:

Li demê serpêçkar pêşnyara destberkirina dûbare çakkirina ewê arîşeyê ewaku ji encamê serpêçiyekê drustbûy diket, evejî dbne :

- taybet, wekî: ez dê di rojên bêhnvedanan da evî karî encamdem.

- netaybet, wekî : dê sehkemê ka dê şem çî bkem.

C- Belêndan jbo dûbare encam nedarê:

eveji bi ewy şeweye, ku hindek derbrînên taybet dhêne bkarhînan ji bo sozdana kesê zulmlêkrî ku ev reftaru rudane di dahatîda dûbare neheve. bo nmûne : ew dûbare nahîte ve

D- Giringpêdana kesê beramber:

Ji bo kênkirina azarên kesê zulmlêkrî, serpêçkar hindek caran bi pirsna halê ewy radbî, wekî: to hest pê dikey ku to başî, to yê başî.

(Hussein and Hammouri 1998 : 37-51) , (Chamani and Zareipur 2010 : 133- 153)

Corekê di ji corên stratîcyetên lêburînxwazîin ê heye, wekî stratîcyetên xwe xlaskirîne ji ewy barudoxî ji alyê kesê lêburîne dixwazîi dhête bkarhînan, ku bi kênkirin a pîleya ewê arîşê ewa hatîye encamdan dijî kesekî radbî. eve barapirîya caran b rêka çend gengesan dhête encamdan, ku diyarê: (çî çênebûye) yan (fiştekê bernekevî) ye. nûnûne bo kênkirina pîla arîse, weku: dê çî arîşe mîne mala te, yanjî bi rêka lumekirina kesekê di û zvirandana berpryaretîyê ji bo ewy, weku: ez bêjim ku filan kes jî di ewê arîşê de berpirs e (Ayad,2017: 92)

pişka duwê: lêburînxwazîin di peywendiyên asoyî û stûnî de

2.1.Lêburînxwazîin di peywendiya asoyîda:

2.1.1.Barê êkê: hebûna arîşê di navbera dû kesên biyanî de: (milê xo li milê kesekê biyanî bdey bê mebest li ser cadey:

Li duv ewan datayên li berdestê me di barudoxekê bi evî şeweyda, bi tinê dû taybetmendiyên lêburînxwazîin ê li dev xelkê me diyar dibin. ewjî derbrînên IFID û mebest pênebûnin.

wêneyê (1)

herwekî di (wêneyê 1)ê serîda diyar IFID dhête hejmartin ji stratîcyetên bi pîla êkê di barekê bi evî şeweyda di navbera dû kesên biyanî de dihête bkarhînan, rêjeya ewê di gehîte 92 ji sedê, herwesa di duv de stratîcyeta mebestpênebûnê bi pîla duwê dhêt, ku takekesên xelkê govera behdîni bi rêjeya 8 ji sedê bkarhî. ji karhînana ewan herdû stratîcyetan bo me diyarê, ku raste ev barudoxe di navbera dû kesên biyanîda peydabûye, belê ji ber biçuykîya ewê arîşeya rudaî, ku bi serpêçiyên sade dhête hejmartin, kesê serpêçkar wekî kiryarêka rewşî ewan derbrînên bikardihînt, belê wekî em dibînin me çendin stratîcyetên di yên lêburînxwazîinê hene. weku (razbûn li ser tawanê, derbrîna kêmasiya xo ... hwd), belê di barekê bi evî şeweyda nehatîne bkarhînan, ku evejî encamê bçukîya ewê arîşê bo me diyar diket.

2.1.2.Barê duwê: hebûna arîşê di navbera dû hevalan de: (seredana hevalê xo yê brîndar di serîda nekey)

Di şrovekirina ewan datayên li berdestê me daxwaza lêburîne ji bo hevalan jî sinûrên xwe yên heyn, her wekî me li serî di beşê tîyorî de diyarkirî, ku barapîtr a caran li demê peydabûna arîşan di navbera dû hevalan de bi lêburînxwazîneka bçuk dhête encamdan, lê eger barudoxê ruda yê ciyawaz bît û hesîyar bît. Weku (serdana hevalê xwe yê brîndar nekey) gelek ji stratîcyetên hemecorên lêburînxwazîin ê dhêne bkarhînan ji hevalê sarpêçkar bo hevalê xwe yê hatîye brîndarkirn.

wêneyê (2)

herwekî di ewan zanyaryên li berdestê meda ku ji alyê takekesên xelkê govera behdînî ve hatîne wergirtin diyar dbe, ku çar ji gîngûrtîin stratîcyetên lêburînxwazîin ê dhêne bkarhînan. wekî: (şrovekirina barudoxî, IFID, derbrîna şermzarîyê, wergirtina berprsyaretîyê e). şrovekirna barudoxê nehatna seredana hevalê xo dhête hîjmartin ji stratîcyeta here zora bkarhatîyên takekesên xelkê evê goverê di haletekê bi evî rengîda, li vêrê kesê serpêçkar hemî hewlên xwe ddet, ku bo kesê hatîye brîndarkirn ruhnbket, ku ew negehşîtye bhêt yan jî bi belge û bhîmana bhaneyan kesê beramber razîbket û hêza ewê arîşê kêmket yan nehêlt, jî berhendê jî de binîn 40 jî pşkdaran ku dgehîte 40 jî sedê ev stratîcyeta lêburînxwazîin ê ya nerastewxo bkarhînaye û bi pîla duwê ewjî bi rêjeya 38 jî sedê, takekesên kurd stratîcyetên derbrînên IFID bikarhînayne, ku bara pîr a ewan derbrînan di şiyanda ye bihêne bikarhînan daku kesê serpêçkar bi bichînanana erkê xwe yê rewşî rabbrî û bi şeweyekê rastewxo daxawza lêburîne ji kesê duwê bket. derbrîna şermzarîyê jî bi pla sêyê dhêt bi 14 jî sedê, li vêrê em dşêyn ruhnkîmê bdeyn, ku ji encamê rewşberzîya takekesên xelkê evê goverê di barekê bi evî şewey de, beramber hevalekî ev hesta şermzarîkîrîne li dev peyda bît. herwesa li pîla dumahîyê, derbrînen berprsyaretî wergîrîne dhêt, ku bi şeweyek ji şeweyan jî alyê beşdarbûyên meve dhêne bkarhînan, ku b rêjeya 8 jî sedê dhêt.

2.1.3.Barê sêyê: hebûna arîşê di navbera xuşk û brayên êk temen de: (**xuşk mubayla birayê xwe bê mebest bşkênî**).

Hebûna arîşên bi evî rengî dbîne egerê bikarhînana stratîcyetên ciyawaz ên lêburînxwazîin ê di nav kelturê kurdî de, lê ev lêburînxwazîin e jî li ser corê ewê peywendîyê û temenê ewan xuşk û brayan dmînî, li duv ewan datayên li berdestê me ku beşdarbûyên me bara pîrîy a ewan di temenekê pêgehşîtda bûn û jîmareka zora ewan xudan xêzan bûn, bêguman encamên bi destê meve dhên, de di ciyawaz bin li gel vekolîneka dî, ku beşdarbûyên ewê di temenekê bçuykda bin, her wekî, ferîq di vekolînekêda ddetê diyarkirn, ku xelkê kurd di temenê danemrîyê de gelek kêmîr daxwaza lêburîne dxwazn ji kesên pêgehşî, herwesa stratîcyetên danemran gelek kêmîr û snûrdartn ji kesên di temenê gencatîyê de. (**Fareeq, 2014: 248**)

wêneyê (3)

ev wêne bo me diyar diket, ku di nav kelturê kurdî de li demê hebûna arîşeka bi evî rengî di navbera xuşk û brayan de stratîcyeta here berblav pêşnyara çakîrîyê bi cudahîyeka kêm, li gel stratîcyetên IFID û mebest pênebûnê. her wekî di wêneyê serîda diyarbît, stratîcyeta pêşnyara çakîrîyê bi rêjeya 35 jî sedê bi pla êkê dhêt û derbrînên IFID bi rêjeya 34 jî sedê û mebest pênebûn bi rêjeya 31 jî sedê li duv ewan dhên, li vêrê raste peywendîya di navbera kesê serpêçkar û kesê zulmîkî de ya nêzîke. belê her wekî d, ewan datayan de diyarbît, pêdvîyê lêburînkîrîna rastewxo û ya nerastewxo bhête bkarhînan ji bo dûbare xoşbûna peywendîyan, çunkî peywendîyên xêzanî zor dgrngn û pêdvîyê li ser her kesekî ewan peywendîyan berz ragrî.

2.1.4.Barê çarê: peydabûna arîşê di navbera dû hevkararan de : (**bas li taybetmendîyên hevkarê xwe bi xrabî bket**):

Di nav kelturê kurdî de taybetmendîyên grêday kesekî yan xêzana ewy gelek hesîyarîin, jî berhendê demê serpêçkar mayîkîrîne li ewan taybetmendîyên kesekî dket, gelek caran arîşên mezn jê

drust dibn, lê dibît bikarhîna stratîcyetên ciyawazên lêburînxwazîin ê bşên gelek ji hêza ewê arîşe bhîne xwarê, ji girngîrîin ewan derbînan jî wekî di wêneyê li xwarêda diyar dibit.

wêneyê (4)

